

PIRS

Kovareke Rewşenbîrî û Serbixwe ye.

Kovara Pirs... .. Hejmar 53 Havîn 2016... .. Buha (200) L.S

kovarapirs@yahoo.com

Pêşgotin	2
Gotar:	
- Penaperên Rojavayê Kurdistanê Li Ewropa û Nakokiyên Jiyânê Dr. Mihemed Zeyno ...	3
- Koçberî Êş û Azar e	Vejîna Kurd 6
- Gelo Rast eteror Bê Ol e?	Mihemed Hesko 8

Lêkolîn:	
- Kokûbinyata Zimanê Kurdî. ...	M. Elî 11
- Helbest Di Navbera Îlhamê û Cefa de. ...	Heyder Omer 20
- Nişkekuştina Mirovekî Mezin Cîhan Hejand.	Memê Alan 26

Ziman:	
- Navdêr	Ji Pirtûka S.F.P.Z.K 32

Wergerandin:	
- Wolfgang Borchert (1921-1947) ...	Tengezarê Marînî 34

Wêje:	
- Van Çavan Çi Nedîtin...! - Deqeke Wêjeyî. ...	Merwan Berekat 38
- Min Bîriya Xwe Kiriye - Bîre - ...	Rûxweşê Zîvar..... 42
- Sînore Bê Nasname - Helbest - ...	Ronî Elî 43
- Çîrok im - Helbest - ...	Mîdiya Berekat 44
- Xewna Kardox - Çîrok - ...	Osman Îso 45
- Du Meyro - Çîrok - ...	Gulistan Awaz 47

Kelpûr:	
- Pend û şîret – Pêkenok. ...	48

Pêgotin:

Pir zor e ku mirov bi hêsanî û bê sedem ji dawa welatê xwe hilbe, û berê xwe bide biyaniyeke ku serûberê jiyana wî dixê guhartineke ne li gor çanda civaka wî ye. Carina ji neçarî mirov ji êş, derd û kovanan berê xwe dide siberojeke ne diyar û li jiyaneke bi ewlehî digere... belê ji neçarî. Lê dema ku mirov bê sedem piştî xwe bide welat û civaka xwe, nemaze ew kesên ku xwe wek berpirsiyar û şîretvan didîtin, ev pirsgirêk û pirseke mezin e.

Wek nas e, dema ku welatek dikeve nav tevlehevî û bûyerên siyasî, berî her kesekî zana, rewşenbîr û siyasîmedar bi rola xwe ya dîrokî radibin, û pêşengiya civakê dikin. Ne tenê yên ku li welêt, lêbelê yên li derve jî vedigerin welêt û hêzê didin gel û civaka xwe. Ma gelo, eger wan kesan berî her kesekî din riya koçkirinê (revê) dane ber xwe, kesên ku çavên wan li wan rêber û pêşengan bûn, dê çi bikin?!

Di van du-sê salên dawî de, rodawa koçberiyê ji Rojavayê Kurdistanê bûye bûyereke rojane, li ser ekran û hemû alavên ragihandinê, lê ta niha jî, tu çare jêre nehatiye danîn. Bêguman eger yakrêzî di nav tevgera rêzanî ya kurdî de heba, dê rêjeya koçberiyê kêm ba, û metrsînên ku niha hene dê tunebana.

Eger çare ji vê koçberiyê re netê danîn, û her kesek bi rola xwe ya rast ranebe, metirsîn mezitir dibin, û jihevketineke pir bi tirs di warê dîmografî û yekgirtina netewî ya kurdî de, li Rojavayê Kurdistanê wê çêbibe.

Ji aliyekî di ve, zor hêja ye, ku Kurdên koçber nemaze yên ku li welatên Ewropa mamfê penaxweziyê wergirtine taybetmendiyên xwe yên netewî û di pêşî de zimanê xwe biparêzin. Zor hêja ye, ku çavên wan li riya vegeerê bin, ji ber ku çendî welatên xelkê xweş bin, welatê me xweştir e.

Desteya sernivîser

Penaperên Rojavayê Kurdistanê Li Ewropa Û Nakokiyên Jiyanê

Dr. Mihemed Zeyno.

Di van du - sê salên dawî de, bi hezaran ji şêniyên Rojavayê Kurdistanê gihane welatên Ewropa Rojava. Ew di pir zehmetî û êşan re, di tengasî û derdan re derbas bûn ta ku xwe gihandin van welatan. Me li ser rûpelên êlêktronîk bi dehan kes dîtî ku çawa ew tiliyên xwe wekî nişana serkeftinê bilind diyar dikin. Her yekî ji wan bi hezaran Dollar û Euro terxanî çete û komên dizan kirin ta ku xwe bigihînin kenarên derya Îce ya di navbera Tirkiyê û Yonanistanê de. Paşê jî banga xwe li xizim û mirovên xwe yên li Ewropa kirin ta ku alîkariyê bo wan rêkin û ew jî bên " bihuşta" rengîn ya Ewropa. Xizim û mirovan jî, ji neçarî bi banga wan ve çûn. Nanê zarokên xwe kêr kirin, bûn deyndarê bankan, û kesên xwe di tehlokê de nehêştin.



Li ba min gelek nimûne û çîrok hene ku çawa dost û hogir bi hawara kesên xwe ve hatin. Gelek mirov bi xwe berê xwe dan Yonanistanê û qasî kanîbûn alîgiriya ji mervên xwe re kirin. Gelek kes bi hezaran Euro şandin wî welatî ta ku mirovên xwe bînin ba xwe, û ez jî yek ji wan im.

Ev erkeke jiyani ye. Ev banga wijdan û ramanê ye. De ka em gavên jiyana van penaberan bişopînin. Piştî gihana Ewropa çî bi serê wan tê? Çawa jiyana xwe didomînin? Çî pîlan di hiş û mejiyê wan de heye? Çawa xort û ciwan paşeroja xwe dibînin? Pirs gelek in, belê pirs dijwar in. Wek civaknasekî min bi zanistî û hûrbînî jiyana

gelek malbatan şopandiye, ji demekê ve bi wan re têkildar im; li axaftin û şêweya ramanên wan, li derd û gilî û gazine wan guhdar dikim. Berî her tiştî ew dibin xwediyê statuya penaberiye û di kampan de bi cih dibin, kêmtir û nizimtir alavên jiyanê bo wan tên pêşkêşkirin. Ji bo penaberekî ku mal û hebûn û kanînen xwe winda kiriye û rût û tazî ma ye, kamp û çend Euro û xwarin qezenceke gelek berçav e. Ji bo penaberekî ji nav kavil û wêrana bajaran rizgar bû ye, aramî li van welatan qezenceke gewre ye û destkeftiyeke mezin e. Ji bo malbatekê ku zarokên wê ji dibistan û zangoyê bê par mane, çûna waneyên ji bo du-sê xulekan şansekî fereh e û nîşana serkeftinê ye.

Xewkirina di nav nivîn û di bin banekî paqij de, ji bo hazaran xewnek bû. Nebihîstina dengê qurşîn, tîfing û

topbaranê, qêrîna birîndaran û fermana çete û kujeran bûye armanca wan.

Bi demê re jiyan aram dibe. Bi aramiya jiyanê re hin daxwez û xwestekên nû peyda dibin. Eger mirov li welêt li aramiyê digere, li vir mirov li xweşiya jiyanê digere. Heger peydakirina pariyê nê li welêt armanc e, li vir xanî û tirimbêl û cilûbergên buha û nûjen armanc in.

Bi mezinbûna zarokan re pirsgirêk jî mezin dibin. Bi demê re çembera jiyanê fereh dibe, dost û nas peyda dibin, şahî pir dibin, daxweza seyran û gera li welatan; çûna ber kenarên derya, razana li hotêlan, vexwendina xweringehan, zemawend û pîrozkirina rojbûnan zêde didin. Herweha alîkariya kesên li welêt mane pêwîstiyêke diyar e û her dem zindî ye.

Ev daxwez û xwestek hemû hewceyî peran in. Pere jî bi kar peyda dibin û kar jî tune ye, an jî derfetên peydakirina peran gelek kê in, û eger kesekî ji xwe re cihekî kar peyda kir zanibe ku ew kar dijwar e û nirxê wî kê e. Daxwez pir in,

kanîn û derfet kêr in û mirov dikeve nav nakokiyekên dijwar.

Her yek dixweze jiyana xwe ciwan û rengîn bike, lê derfetên ciwankirinê pir lewaz û kêr in. Jin êdî de'wa cilûbergên nûjen dike, keç dixweze mîna hevalên xwe moderin derkev e û xûya bibe, law daxweza peran dike da ku ew jî xwe wek hevalên xwe bibîne û bav daxweza kar dike û kar jî peyda nabe. Ew alîkariya ku penaber ji dezgehên dewletê werdigre nema bes dike û tîbûna jiyane naşikîne. Sedemên peydakirina kar gelek in, lê ya herî sereke ziman e. Fêrbûna zimên jî demeke dirêj dixweze, ji bo kesên ku temenê wan mezin e fêrbûna zimên gelek dijwar e, û ji bo mirovên nexwende pir û pir zor e. Ya ku bala mirov dikêşe, ew e ku gelek xort û keçên nûgihayî û temenbiçûk, ango (20 -30) salî bê belge û bê dîplomîn, wan hemahema xwendina seretayî li dibîstanên welêt qedandine û piştê ketine nav kar, hiş û ramana wan bi

gelemperî li ser peydakirina alavên teknîk û nûjeniyê ye.

Li van welatan bi zehmetî dikanin kesayetiya xwe biçesipînin. Ji dêvla ku hewil bidin riya jiyane biqelêşin, hema-hema daxweza vegera welêt dikin, ev jî nîşana rev û bazdana ji jiyane ye.

Dema ku em ji wan re dibêjin: Bixwînin, xwendin riya azadiya we ye, bersiva wan ev e: Na dema li welêt şer bi dawî bibe, emê vegerin. Di van nakokî û pirsgerêkan de penaber jiyana xwe didomînin. Ew dîlê van nakokî û destgirêdayîne ne.

Di nav dîwarê her malbateke penaber de qêrîn, pevçûn û rûhişkî heye, û ji encama van nakokiyên gelek xort û keç ji mala bavê xwe derdîçin û xwe radestî dezgehên dewletê dikin, gekek jin û mêr daxweza hevberdanê dikin û gekek kes jî xwe dikujin.

KOÇBERÎ ÊŞ Û AZAR E

Vejnâ Kurd



Di dirêjiya dîroka mirovahiye de, koçberî bi şêweyên xwe yêncurbecur di hemû civakan de çêbûye û sedemên wê jî curbecur in. Piştî şerê cihanê yê diwemîn cara yekê ye ku mezintir pêla koçberan di sedsala bîst û yekê de ji Rojhilata Navîn berve Ewropa û seranserî cihanê ve diçe,

Di van çend salên ku Sûriyê di qeyranekê re derbas dibe de, piraniya xelkê Sûriyê bûne mişext û penaber û hîn rêjeya wan bilintir dibe, ji ber wê jî, li ser ekranên televizyonan, di hemû alavên ragihandinê de, û li ser maseya dewletên mezin ev rûdaw bûye mijara gengeşekirinê, lê çare ne diyar e.

Hin ji sedemên vê koçberiyê yêncureke ev in: Şerê navxweyî, têkçûna ewlehiyê, rewşa aborî ya ku roj bi roj jiyana xelkê dijwar û pirasteng dike, lihevnekirina aliyên siyasî û nediyarbûna çareya vê qeyranê. Yanê xelkê Sûriyê neçar e, ku berê xwe bide

welatên cihanê û jiyaneke bi ewlehî û baştir ji xwe û zarokên xwe re peyda bikin.

Çendî rê li pêş koçberan hatine astengkirin, dijwarî pir bûne û hin dewletan jî koçberên Sûriyê xistine bazara berjewendiyên xwe, tevî wê jî zincîra vê koçberiyê ranewestiyê, û roj bi roj bi riyên curbecur koçber berê xwe didin sînoran û ji aliyê perehez û rêberên sînoran ve tîncxapandin û rastî êş û azaran tînc. Ne tenê weha, lêbelê pir ji wan jiyana xwe ji dest didin, hin birîndar û seqet dibin, hin jî di navbera sînoran de asê dimînin.

Koçberî kul, êş û azar e, dîmena zarokê sê salî, Alanê Kurd, yê ku bû qurbana pêlan û laşê wî li

kenarê deryaya Sipî hate dîtin, wijdanê mirovatiyê bi tevahî hejand û bû simbola tirajîdiya derd û birînên miletekî bindest. Alan ji mirinekê bere mirinekê diçû, lê wî nizanîbû ku ewê peravên deryayê jî bi girî bike.

Di pêvejoya dîrokî ya civakan de, koçberî ji aliyê sedem û encaman ve gelek zîyanbar e, û bi taybet ji bo civaka Kurd, ji ber ku xêrnexwezên Kurdan ji berê û paşê de çavên xwe ji Kurdan sor in, û hewil didin ku me ji xaka Kurdistanê derxînin, lê mixabin îro armanca wan bi destên me pêk tê. Dema ku Kurd koçber dibin, ew mal, zevî û her tiştekî xwe

difiroşin û kesên Erebi li şûn wan cih digirin û herweha herêmên kurdî ji wan vala dibin û guhertinên demografî bi şeweyên pilankirî di herêmên kurdî de peyda dibin.

Li aliyekî din ne hêsan e, ku koçberên Kurd kanribin xwe û zarokên xwe ji çanda ew civaka biyan biparêzin, û pir zor e ku ew li welêt vegerin. Belê hatiye dupatkirin ku bi demê re ewê di wê civakê de werin pişaftin, û nifşek li pey nifşekî dê wînda bibe. Ji ber wê jî koçberiya Kurdên Rojavayê Kurdistanê bi ev rêjeya bilind cihê metirsîneke mezin e, divê pêşî lê were girtin.



GELO RAST E TEROR BÊ OL E?



Mihemed Hesko (Birasoz)

Nivîskar û siyasetmedarê Ingilîzî Bincamîn Dizraîlî dibêje: **“Li kû nasîn bidawî dibe, li wir ol dest pê dike”**.

Vaye dîsa terorîstên îsalmî neviyên çanda biyabanê xwe bi hovîtiyê xemilandin, pêr li Parîsê, duh li Birûksilê, wê sibe komkujî li kû be gelo? Ev kom û girûpên olî yên radîkal bûne belaya vê hevçerxê, him li ser gel û welatên xwe, wek Dewleta Îslamî li Iraq û Şamê (DAIŞ) li Rohilata Navîn, û giropa Boko Haram li bakurê Afrîka û H.W.D, û him li ser cîhanê, dixwazin dem û çerxê berevajî bizîvrînin û jiyana

pêşiyên xwe vejînin, ew jî Şûngiriya Îslamî ye!

Dîroka diyarde ya xwekujiyê kevnar e, di dîroka nêzîk û ya kevin de xwekujiya bi kom jî heye, û ta niha salane li hemû welatên cihanê bi sedan kes dawiyê bi jiyana xwe tînin, lê belê kesî xwe di nava xelkên sivîl de ne teqandiye, daku bi kuştina xwe re hejmareke ne diyar ji xelkên sivîl û bê guneh bi xwe re bikuje.

Ji dema pareyên petrodolar ve ku li Kendava Erebi û bi taybet li Erbistan Si,ûdî peydabûn, piroseya belavkirina baweriyên reş ên Wehabî û îslama radîkal dest pêkiriye, ew felsefa ku can bê nirx dike, û mirinê di ser jiyana re digire û kuştinê helal dike, nêrîna xwe ya mîtafîzîkî bi rastiya vê dunyayê berdêl dike, hilgîrên vê felsefeyê wê nikaribin digel guhertin û

pêşketinên di cihanê de qewimîne xwe biguncînin, û wê her di sêkoşeya neşengiyê de ya ku bi reşnêrînê sêrî xweyatiya xwe, civakê û pêşerojê dikin wê bijîn.

Erê name diyar e, ji wan were ku bi xwekuştinê, ango teqandinê wê tenahî û aramiyê di civakê de bikujin, namegihandineke xiraptir û hovtir awayî ye, ew jî çavtirsandin û tirsandina xelkê ye, û encamder di wê baweriyê de ne, ku bi van karên qirêj û hovane, wê felsefa olî ya xwe bi ser xelkê de bi darê zorê bisepînin, ev yek li gor rêbaza xwekujane ya ku mele û şêxên nezaniya pîroz ku ew xwekuj li ser perwerdekirine û mejiyê wan bi Hedîs û Ayetên Cîhadê şuştin e ku, bi kuştina xwe û hejmarek kesên bê gunehê wê biçe bihuştta rengîn ya bi firîşteyan dagirtî, û bobelata mezin ew e ku hemû bawermendên ola îslamî bi têkestên xwekuştinê (cîhadê) bawer dikin, û eger na hemû

gawir in, ma gelo ev ne serxweşkirin û bê hişkirina mirovan e wek Karl Markis gotiye: ``*Ol efyona gelan e, eger were bikaranîn*``.

Tirajîdî ango bobelat ew e, ku tevahiya dunayê dît û bihîst ku DAIŞ`ê çi bi serê jin û mêr û zarokên Kurdên me yên Êzîdî û Xirîstiyânên devera Mûsilê li Başûrê Kurdistanê kir, û çawa jinên me li bazarên koletiyê hatin firotin, û bi ber destdirêjîya çeteyan ketin, û mêr çawa kuştin û zarok birin û bi darê zorê kirin Misilman, û warên pîroz ên Êzîdîyan wêran kirin, û çawa serê mirovan li pêş kamîreyan dibirîn, û ev tawan hemû di bin navê ``Allahu Ekber``de û li gor Ayet û Hedîsên ola Îslamî encama didan, û hîn rêjeyeke baş ji Kurdên me yên Musilman hene dibêjin: ``*kar û reftarên çeteyên DAIŞ`ê ne ji Îsamê ne, û evane nûneratiya Îslamê nakin*``. Tevî ku ti sazîyên dezgehên Îslamî li asta herêmî yan cîhanî ev kar û

tawanên DAIŞ`ê şermezar nekirin e.

Birano...win çima bi çavên girtî sêrî vê pirsê dikin, ew bi xwe dibêjin û radighînin ku ew rêbaza Îslamê bi cih dikin û bi rêve dibin û Îslamiya rast û dirust ev e, lê diyar e ew rêjeya Kurdên me yên Musilman bi sendroma Stokholmê ketine, kesên bi vê sendromê dikevin bi çavekî erênî sêrî dagîrkeran

ango dîlkerên xwe dikin, û spasdariya dîlkerên xwe dikin ku ew nekuştine. Bi vê helwesta xwe ew rêje ji Kurdên me û alavên ragihandinên erebî reklama ku dibêje: ``**Teror bê ol e**``, hevdeng in û wê reklamê belav dikin.

Ev silogana li ser pêdivî bi bersiveke zelal û wêrek ji şêx û meleyên me heye, ji ber ku ew olê me ji me baştir dizanin?



Kokûbinyata Zimanê Kurdî

M. Elî



Mirov guman dike, ku ew komên mirovên hişdar ên destpêkî, yên ku bi hev re di nava komeke civakî de dijîn, wan deng, destnîşan û gotinên taybet ji xwe re darijti bûn û pê ji hev têdigihîştin. Pişt re, û di pêvajoya pêşveçûna hezar salan de, ew deng û destnîşan her diçûn dewlemend dibûn, pêş ve diçûn, diyartir dibûn û li ba hemî endamên her civakeke hevgiretî dibûn, û bêjeyên xwedî mebest û wateyên nasraw. Û herwiha di pêvajoya wan pêşveçûnên demdirêj de, zimanên ku em îro pê daxivin hatin darijtin, û li ba her miletekî pergalên cudawaz û taybet standin û pê hatine nasîn.

Lê belê, ji ber ku ew mirovê kevin tu nivîs ji deng û axaftinên xwe re ne afirandi bûn, loma jî, bêje û pergalên ew zimanên dêrîn, yên berî afirandina nivîsê, yanê li demên berî dîrokê, ne hatine naskirin û ji zaniyar û lêkolînvanan re bûne cihê pirsine berdewam û mezin.

Lê belê, ji navîna hezarê çaran berî zayîne de, mirovê hişdar li Rojhilata Nêzîk dahêneke pir giring afrand, bi riya wê dahênê, guherîneke zor gewre di tevahiya jiyana û dîroka mirovatîyê de pêk hat, ew dahên jî afrandina "Nivîsandina Mîxî" bû.

Ew karê dîrokî ji hêla gelê Somerî de hat kirin. Bi destê mirovê Somerî û bi saya nîşandek û tîpên ku wî bi darikê xwe kişand, şoreşek mezin di dîroka mirovatîyê de çêbû, û berbanga dîroka li ser zemîne dest pê kir. Ji ber ku ew Elfebêya şewexêzî ya Mîxî, ne tenê

ji gel û zimanê Somerî re rêvekirineke nû bû, ew ji zimanên hemî gelên Rojhata Nêzîk re jî, nemaze ji zimanên gelên Mêzopotamiya û çiyayên Zagrosê re elendek bû, ji ber ku, bi riya wan nexşetîpên destpêkane, mirov kanî raman û gotinên xwe bikirina nivîs, ziman û jiyana xwe bidana nasîn, û hebûna xwe li ser rûpelên dîroka mirovahiyê binivîsanda.

Li ber ronîya şûnewarên nivîskî ên zimanên kevin, û beramberkirina wan bi zimanên ku niha li beşê başûr ji Rojhilata Nêzîk, Bêla Êranê, Nîvbejeka Hindî û bejeka Ewropayê hîn zindî ne, li ber ronîya wan, ji zanyaran re diyar dibe, ku ew hemî ziman ji yek koka zimanî ne.

Û ji bo çespendina nêzîkbûna wan zimanan û koka wan a hevbeş jî, zimanzan pala xwe didin ser hin pergala û salixên zimanî ên sereke, wek: Navên yekîte, yên kevnare, yên tiştan û endamên sirûştê û govdê mirov, û şeweya darijtina bêjeyan û veguhastina wan jî.

Li gor ew bingeheên zanistî, zanyar û zimanzan dibînin, zimanên ku roja îro li deverên fere ji Bakur Rojavaya bejeka Asya û Nîvbejeka Hindî û Ewropayê, ji yek malbata zimanî ne, û wê bi koma Malbata Zimanên Hîndo Ewropî- Arî bi nav dîkin. Birastî jî, gelek bêje, navên kevin û hevbeş di navbera wan zimanan de hene. Wek nimûne, bi sedan navên hevbeş ên tiştên sirûştê, ezmên, jîndaran, endamên govdê mirov û hwd... di navbera zimanên Kurdî, Îngilîzî, Firensî, Almanî, Hindî, Afganî, Farisî û ta Rûsî de jî hene. Ji hêleke din ve, zimanên Arî ji zimanên kîtokî^{مقطعي} ne, ango kîtokî bi hev dikevin û bêjeyan çêdikin. Ji hêla veguhastinê de jî, digel ku zimanên Arî niha serbixwe ne, û rêzikên veguhastina wan jî xweser bûne, lê hîn jî bi sedan kokên lêkeran û rêzikên hevbeş, di navbera gelek zimanên Arî de hene.

Ji bilî ew bingehên zanistî, xaknîgariya hevbeş jî ku gelên Arî jê belav bûne, yanê çiyayên Qafqasê û derdorên derya Qezwînê, ew kirde jî di warê pêwendî û mirovantiya wan zimanan de xwedî roleke giring e.

Li gor belavbûna zimanên Arî li ser deverên xaknîgarî, jêderên zimanasîne wan parve sê komên zimanî dikin:

1 - Koma Ewropî: Piraniya zimanên gelên bejeka Ewropî di nav de ne.

2 - Koma Hindî: Zimanên Ordî û Hindistanê di nav de ne, ew li nîvbejeka Hindistanê tî xebtandin, jê zimanên (Hindî, Bakistanî... û hwd).

3 - Koma Êranî: Ew jî parve du komikan dibe:

- Komika Êranî a Rohilatî, ji zimanên Efganî, Bilûşî, Esîtînî ... û hin din jî pêk tê.

- Komika zimanên Êranî a Rojavayî, ew jî du beş in:

a - Beşê zimanên Başûr Rojava, zimanê wê yê sereke Farisî ye.

b - Beşê Bakur Rojava, di nava wê de jî zimanê Kurdî sereke ye.

Zimanê Kurdî

Li serdemên berî zayîne dema ku goçên gelên Arî bi ser Rojhilata Nêzîk de hatin, Kurdistan ne vala bû, wê hingê gelên Kurdistanê ên kevnare lê dijîn. Nêrînen zanistî dibêjin, ew gelên ku berê hebûn, zimanên wan ji bingeha xwe a kevin de ji zimanên Arî bûn û belkî nêzîk zimanên Qefqasê bûn. Li ser ev mijara giring, zanayê Kurd ê navdar Mihemed.E. Zekî, pala xwe dide ser gotînen gelek dîrokzanên navdar û wiha dibêje: ((Zimanên gelên Zagrosê yê herî kevnare zimanine Arî bûn. Hin zanyar jî dibêjin, ew ji zimanên navça Qefqasê bûn û pir nêzîk hev bûn)) (Emîn Zekî, rûp 60).

Bêguman nêrîna zanayê gewre M. E. Zekî cihê rêz û baweriyê ye, lê li ber siya wê ramanê mirov kane wiha jî bêje: Çima ew zimanên kevnar, çi Qefqasî çi Arî, wê bi riya mirovê hişdar ê Kurdistanê ê kevin wê ji Kurdistanê ne gihîştî bin Qefqasê û warê Ariyên kevin ku li derdora derya Qizwînê dijîn? Jixwe eger em baweriya olî bipejrînin, emê dîsa bigihên wê baweriyê, û bêjin ku motika zimanên Arî Kurdistan bû û ji wir de li herêmên derdora xwe û paşê jî li Ewropa û Asyayê belav bû.

Di vê babetê de, ango di babeta arîtiya zimanê kurdî de û pêwendiya wî bi zimanên Kurdistanê ên kevintir re, zanyarekî mezin wek Fledîmêr Mênorsky wiha dibêje: ((Zimanê Kurdî ê nuh gelek hêmanên xwe ên bingehîn ji zimanê Medî ê Hindo Ewropî wergirtine)). Yanê mera ji gotina Mênorsky têdigê, ku zimanê Kurdî berî zimanê Medîyan li Kurdistanê hebû û bi kelijandina wî bi zimanê Medî re bejna xwe ya dawîn stand.

Li ber ronîya rastiya nêrîna Mênorsky û gelek zanyarên din, zimanê Kurdî ê niha dê pergalên xwe ên dawîn ji sêyekê destpêkê ji hezarê yekê berî zayînê de standi be. Yanê Kurdî zimanê Medîyan e, lê wî tibabeke mezin ji bêje, têgeh, pergal û taybetiyên zimanên gelên Kurdistanê ên berî hezarê yekê berî zayînê di xwe de hilgirtine, mîna gelên: (Lolo, Gotî, Kaşî, Horî...) . Mîna ku tê zanîn, ta roja îro, gelek bêje ji zimanê Kurdistanê ên berê di nav zimanê Kurdî de hene û li ba kurdan û di gelek zimanên Hindo Ewropî yê din de jî tî xebtandin, mîna jimarên Horî (Eyka = yek, pênc = pênc, niwa = neh), bêjeya (keybano = kebanî) a Horî ku bi wateya: Xanima male ye, bêjeya "kanî" a Horî û hwd.

Wek serencam di babeta kok û dîroka zimanê Kurdî de, nêrîna herî xort û pêbawer ev e: Zimanê Medî ê Arî bi zimanê Kurdistanê ên berê re têkel bûye û di pêvajoya sê hezar sal de zimanê me ê Kurdî ê niha hatiye afrandin. Di vî warê de, zimanzan mêlag dikin, ku zarava

Kurdî a Zazakî ku beşek ji Kurdên Kurdistanê Tirkîyê pê daxivin, nêzîktirîn zarav e ji zimanê Medî ê resen ve.

Zimanên Rojhilata Nêzîk û zimanê Kurdî

Digel rastiya serbixwebûna zimanê Kurdî ku zanyarên şareza li ser hev kirine, hin nêrîn derdikevin û dibêjin, ku zimanê Kurdî ji demine nêzîk de ji zimanine din hatiye darijtin! Wek mînak, hin dîroknivîsên Ereb dibêjin ew ji Erebî hatiye darijtin, hin nivîskarên Tirk jî dibêjin, ew zimanê Tirkê çiyayî ye, Farisê netewperest jî li ser wê şopê diçin û zimanê Kurdî wek zaravekî ji zimanê Farisî dibînin.

Bêguman ev helwestên han bervajîkirina rastiyan e. Mebesta bingehîn jê înkarkirina hebûna gelê Kurd û biçûkirina meqama wî û zimanê wî ye. Ji bo zelakirina ew gumangêjkên siyasî ên dûrî zanistiyê, emê bikurtahî rastiya wan helwestan bidin ber çavan.

Zimanê Kurdî û Farisî

Li derbarê têkiliyên di navbera hr du zimanên Kurdî û Farisî de, rojhilatnasê nasraw Sêdnî Simês dibêje: ((Pisporên pêbawer yên ku mirov kane pişt a xwe bide nêrînên wan, dibînin ku zimanê Kurdî ne ji zimanê Farisî hatiye darijtin, li bervajî wê, ew zimanekî xweser û serbixwe ye, û pêşveçûnên wî ên rastînkî û zanistî ên kevin hene. Û sebarek ewên dibêjin, ku zimanê Kurdî ji bingeha xwe de Farisyeke badayî ye, rastiya rast li bervajî wê ye, ji ber ku zimanê Kurdî ji zimanê Farisî yê ku "Kevala Dara" a navdar pê hatiye nivîsandin kevintir e, loma jî ji zanyaran re têder ku bêjin, zimanê Kurdî li sedsala şeşan berî zayîne de hebû û zimanekî xweser û serbixwe bû)).

Li ber ronîya bawerîya zanyarekî mezin mîna Sêdnî Simês, tê çespendin ku zimanê Kurdî û Farisî du zimanên cuda ne, û zimanê Kurdî ji her aliyekî de xudî kesayetîyeke xweser û serbixwe ye. Lê belê, rastîne din di vî warî de hene lêkolînavan nikanin di ser re gav bikin, ew jî pêwendiyên dîrokî û hemsîtiyên xaknîgarî ên demdirêj ku di navbera Kurdan û Farisan de hebûn û ta niha jî berdewam in. bêguman, ew têkliyên ku ji sê hezar sal de lidar in, nêzîkbûneke berçav di navbera her du zimanan de peyda kirine, nemaze jî di navbera zaraveyên Başûrê Kurdistanê û Farisî de.

Ev ji aliyekî de, ji aliyekî din de, gelek tiştên hevbeş ên bingehîn di navber hemî zimanên malabta Arî de hene, Kurdî û Farisî jî di nav de ne. Loma jî lêkolînavan dupat dikin û dibêjin, ew nêzîkbûna ku di navbera wan de heye, tenê ji ber ku ew ji yek malabatê ne û di serdemên dirêj de di deverke xaknîgarî e hebeş de rabûne û jiyan e.

Zimanê Kurdî û Erebi

Wekî ku hatiye zanîn, zimanê Kurdî û Erebi ji du malbatên zimanî yên cuda ne, Arî û Samî. Yanê ew ji bingeha xwe a zimanî, nijadî û xaknîgarî de ji hev cihê ne. Ev rastiyeke zanistî ye û guman li ser tune. Lê belê rastiyeke din heye gerek e mirov wê jî bide ber çavan, ew jî ew e ku zimanên Samî û zimanên Gelên Çiyayî, ango zimanên gelên Kurdistanê ên kevin, di gelek serdemên dîrokê de gihane hev û hîkarî li hev kirine.

Wekî ku hatiye zanîn, li dawîya hezarê sîsiyan berî zayîne gelê Ekadî ê Samî qiraltîyeke navdar li başûrê Êraqê ava kiriye. Ew cara yekê bû ku miletekî Samî û gelên Çiyayên Zagrosê ji aliyên xaknîgarî û şaristanî de digihîştin. Pişt re, gelê Aşorî jî li destpêka hezarê yekê berî zayîne di hilperîna xwe a duyem de, tevahiya xaka Kurdistanê û deverine fere ji Rojhilata Nêzîk dora sê sed sal kiri bûn

bin deslata xwe. Li wan deman Aramiyên Samî gihîştin deverên çiyayên Torosê û gelek mîrîtî li ser xaka dewleta Mîtanî û welatê Horiyan ava kirin. Bêguman ew nêzîkbûna xaknîgarî û şaristanî di navbera gelên Samî û gelên çiyayî de, dê hikarî û têkilhevbûnên berçav di gelek waran de kiri be, nemaze jî ware zimanî de.

Lê sebarete zimanê Erebi, ew bi Ereben misliman re ji nîvgirava Erebi derket û gihîşt bakur Sûriyê û Kurdistanê, ji ber ku berî wê demê, zimanê gelêrî yê welatê Şamê Aramî bû û wek Ibin El Şuhnê di El Dur El Muntexeb (rûpel 27) de dibêje "sînôrê Ereban Beyaban bû û Bêhna Erebiyê li bakurê Sûriyê tune bû". Yanê eger bandoreke zimanê Erebi li zimanê Kurdî hebe, piştî Îslambûna Kurdan bûye, lê hîç ne tê wê wateyê ku zimanê Kurdî ji zimanê Erebi yan ji zimanekî Samî î din hatiye girtin, nemaze jî hatiya zanîn ku zimanê Kurdî ji berî serdema Îslamî de heyê.

Yanê bi tevahî em kanin wiha bêjin: Zimanên gelên Samî wê hikarî li hemî zimanên Rojhilata Nêzîk kiri bin, di nav wan de zimanê Kurdî jî heyê, lê bêguman bervajî wê jî dê rast be, yanê zimanên samî jî dê keti bin bin bandora zimanên Gelên Çiyayî. Lê belê ew bandora tenê di warê bikaranîna hinek bêje û navên xaknîgarî de bû. Delîl jî ew e, ku tu pêwendiyên rêzmanî ên girîng di navbera zimanê Kurdî û ên Samî de xuya nabin. Sedem jî naskirî ye, ji ber ku ew ji kok û bingeha xwe a dîrokî, nijadzadî û xaknîgarî de zimanekî Arî ye û ji zimanên Samî cihê ye.

Zimanên Kurdî û Somerî

Sebarete zimanê Somerî, wekî ku çawa zanyaran li ser warê ku gelê Somerî jê hatiye li hev ne kirine, wiha li ser têkliyên di navbera zimanê Somerî û zimanên Rojhilata Nêzîk a kevin de jî ne gihîştine hev. Hinek dibêjin ew zimanekî serbixwe ye û têkliya wî bi zimanên

Arî û Samî re tuneye, hinek jî dibêjin ew nêzik zimanên Samî ye. Nêrînek din jî heye dibêje ew ji malbata zimanên Gelên Çiyayî ye. Di vê babetê de, destnîşanên xort hene jê guman dibe ku renge zimanê Somerî û zimanên Gelên Çiyayî ji yek kokê bin. Çinkî zimanê Somerî ji aliyê binyat û darijtina bejeyan de ji zimanên kîtokî bû, di wan zimanan de kî bi hev dikevin û li gor rêzikên taybet bêjene nû çêdibin (Dr.Hîşem El Sefedî rûp 126). Ew ji taybetî û pergale zimanên Arî ye jî, û mîna ku em zanin zimanê Kurdî jî zimanekî Arî û kîtokî ye, bêjeyên wî jî bi alîkariya gelek pêrkî, parkî, rayên lêkeran û lêkerên alîkar bi riya lezqandinê tîni darijtin.

Ji bo diyarkirina tîklyên di navbera zimanê Kurdî de, wek zimanekî Arî, û zimanê Somerî de ku zimanê nivsandinê ê herî kevnar ye, û zimanê Erebî ku mînak e ji malabata Samî re, emê li jêr çend bêjeyan ji zimanên Somerî, Kurdî û Erebî beramber hev bikin:

Somerî	Kurdî	Erebî
Lo	Lo, (alava matmayînê ji bo nêrza)	رجل، إنسان
Kor	Ko, çiya	جبل
Sağ	Seri	رأس
Nînda	Nan	طعام
A	Av Aw,	ماء
Şe, ce	Ceh	شعير
Gud	Ga	ثور
Kûr	Kûr	العمق
Dar	Dar ⁽ⁱ⁾	شجرة

Ji vê lîstê xuya dibe, ku nêzîkbûna balkêş di navbera bêjeyên Somerî û Kurdî de ye, ne zimanê Erebi.

Li ber roniya zanînen ku li jor hatin gotin û jêderên dîrokî û zimanzanî jî diyar dikin, û wek serencam, zimanê Kurdî ê niha, ji bingeha xwe de zimanê gelê Medî ê Arî ye. Med gelê dawîn bû ku li despêka hezarê yekê berî zayîne hati bû Kurdistanê. Lêkolînavan diyar jî dikin ku zimanê Kurdî teşeya xwe ya niha ji ew dema dîrokî standiye, lê belê wî gelek pergala û bêje ji zimanên gelên Kurdistanê ên dêrîn jî di nava xwe hilgirtine. Lê ya rast hîn ji berê de mirovatiyeke xaknîgarî û nijadî di navbera gelên Kurdistanê ên kevin û yên ku ji Bakur de hati bûn wek gelê Med hebûn

Rastir şaristanî, şaristaniya ramanê ye, û tiştê ku pirtir wê diparêze ziman e. Ji ber wê jî mîletê ku pêşvebirina jiyana xwe ya şaristanî bi zimanê xwe yê netewî nenivîsîne, berê wî mîletî berve windabûnê ye.

M. Berekat.

Helbest Di Navbera Îlhamê û Cefa de

Heyder Omer



Bê ku em dîroka helbestê, wek celebekî wêje, dubare bikin, em dikarin xwe bidin kêlek gelek dîroknivîs û rexnevanên wêje û helbestê, û weha biçin, ku helbest, li nik miletên, ku wêjeya wan ji roja zaroktiya wan de hatiye naskirin, di pêşiya pexşanê de bûye; ango helbest ji beriya pexşanê hatiya naskirin, ji ber ku ew li ber dergêhên zaroktiya miletan ji dayikê bûye, û ji wê demê de jî awayê nivisandina helbestê bûye mijara gelek dan

û standinan, û gelek rexnevanan cefayên mezin, di vê babetê de, diyarî...pirtûkxaneyên mirovaniyê kirine, û hîna jî dikan. Pêre jî diyar dibe, ku wan her tim tiştê, ku helbestê û pexşanê ji hevdu cuda dike, dipelînin.

Mixabin, pirên guftûgowên, ku di vê mijarê de, li ser zibanên pirên helbestvanên me digerin, didine xuyakirin, ku haya wan ji evan cefayan tune ye, an kême, pêre jî xuya dibe, ku ewana weha diçin, ku kêş, bi tenha xwe dikare helbestê û pexşanê ji hevdû cida bike, û deriyê helbestê li pêş her kesekî li ser piştê veke, bi ser de jî hinek dibêjin: „*Ma form dikare çî li helbestê zêde bike ?* »..Gelo ev yeka rast e?.

Bi rastî eger ev boçûn li cihine din de bête gotin, belkî bi hêsanî derbas bibe, bê ku

bala mirov bikşîne, lê gava di meydana helbestê de tê gotin, gelek pirsên, ku li derdora zanîna xwediyê wê digerin, dilivîne.

Wek me berê gotiye, helbest celebekî wêjeyî kevn e, her weha ji wê kevinbûnê de jî bûye mijara rexnevanan. Berî pêşî helbest li gel îlhamê hate bestandin, û hate gotin, ku helbestvan li gel xwedayê huner (uses), ku li gor boçûna efsaneyên Girîkan, zîmbola wê îlhamê bû, têkildar e.

Fîlozofê Girîk; Efletûn ji zû de pirsek berda holê: Gelo îlham jêdera helbestê ye, an cefa?. Ilham jî li ba wî li gel Xweda gorêdayî ye. Lê li benda bersivên kesên din nema, belê ewî bersiva pirsê xwe da, û weha çû: Helbesta, ku jêdera wê ne îlham be, ji îlhamê neherike, bê nirx dimîne, îlham dişê helbestvan bixe pergaleke mîna pergala sofîtiyê û pêximberiyê, cefa û xebat têra afirandina helbestê nakin, ji ber ku helbesta helbestvanê ku

hestên wî sar in, nikare hilkişe asta ya hestên wî germ in.

Rexneya Romayê ya kevin di bin bandora vê boçûna Efletûn de milxwar bû, û gelek rexnevanên wan, mîna Şîşron, Horas û ên din xwe dane kêlek boçûna Efletûn, û nerîna wî cûtin û dubare kirin.

Her weha gelek nivîsevan û helbestvanên serdema raperîna Ewropayê jî weha çûn, ku helbestvan xwediyê helwesta pîroz û derûna xwedayî û zîrekiya, ku ronahiya Xweda wê dafirîne ye. Lê bi vê yekê tenê qayîl nebûn.

Rexnevanên Ereba yên kevin jî li gor vê boçûnê, gotin, ku her helbestvanekî şeytanek heye, hêza helbestiyê di wî helbestvanî de dafirîne⁽¹⁾, ango ewana jî helbestvanî xistin bin bandora hêzeke veşartî û raz, bêyî wê hêze helbestvan nikare helbestê bafirîne.

Dêmek Efletûnê Girîk berî pêşî weha çû, ku helbesta nirxbilind berhema îlhamê ye, ji ber ku, wek ew dibîne, cefa bi

tenha nikare helbestê bafirîne⁽²⁾. Lê tevî vê boçûna wî, ku giraniyê nade cefayan, belê tenê bi lez rola wan nîşan dike, mirov nikare çavên xwe li hember wê rolê damirîne; angê helbest, li gor boçûna Eflatûn, berhema îlhamê ye, lê hinek cefa jî pêwîst e, da naveroka îlhamê wergerîne.

Lê di pey Eflatûn re, şagirtê wî Erîstotalîs hat, û nerîneke eşkera diyar kir, tevî ku ewî jî, li gor mamostê xwe, naveroka civakî û perwerdeyî ya helbestê teqez kir, lê ewî rola cefa ji ya îlhamê, ne tenê, kêmtir nekir, lê bi ser de jî îlhamê ewqas bala wî nekişand, ji ber ku rûdawên helbestê bala wî kişandin, pêre jî ewî riyeke din, di penava şirovekirina helbestê de qelaşt, ji ber ku ewî zagon û usûlên hunerî, û bandora wan, ku helbest li gor wan tê afirandin, pelandin, û pêre jî Eflatûn û Erîstotalîs, di meydana rexna helbestê de, bûne du nûnerên du rêgayan, ku heya vê serdema nû tene gengeşekirin, û bersiva wê pirsê dipelînin: Gelo

afirandina helbestê giraniyê dide îlhamê an dide kar û cefayên helbestvanan?!

Evî cefayê, ku Eflatûn rola wî bi lez nîşan dike, û Erîstotalîs jî wî gelekî biha dinirxîne, bala nivîsevan û rexnevanên serdema raperîna Ewropayê kişand, ewana ew zor bilind nirxandin, û weha çûn, ku afirandina helbestê gelek cefa û kar jê re divên⁽³⁾.

Wek ku me li jor gotiye, gelek ramanbîr û fîlozofên Romayê, û nivîsevan û helbestvanên serdema raperîna Ewropayê bûbûne dîlên beşê yekem (îlham) yê boçûnên Eflatûn, û ewana cûtin, lê nivîsevanên wê serdemê rola kar û cefayê helbestvan ji bîra nekirin, ta ku ewana gîhane sedsala 17ê, ku rêbaza kilasîk destlatdar bûye⁽⁴⁾, wê hîngê felsefa Erîstotalîs, ne ya Eflatûn, li ba kilasîkan destlatdar bû, û rexnevanên wê demê bûne melderên nerîna wî, û cefa û karê helbestvan, ji aferîna helbestê bala wan zor kişand, û ewana şêweyê derbirina helbestî pelandin.

Di pey wan re romantîk hatin, û careke din boçûna Eflatûn (helbest berhema îlhamê ye) vejandin, û helbest ji bin sîbera hiş ber bi sîbera hestan bi tenha de kişandin, û weha çûn, ku îlham û paşhestan (bêageh) kaniya helbestê ye, ji ber ku

ewana mêldarên xweyîtiya mirov bûn, ew gelekî biha dinirxandin, û hest didane pêşiya hiş. Lê tevî vê yekê jî gelek helbesvanên wan, ku rexnevan bûn jî, nixê îlhamê kêmtir dikirin, wek çawa helbestvan û rexnevanê emerîkî Êdgar Alan Po dibêje, ku: „ ... *pozbilindiya helbestvanan rê nedida wan, ku li xwe mukur bên, ka çi qas cefa di ber afirandina helbestê de dikşînin, ewana wî cefayî nîşan nakin, da kesên din bidin qayîlkin, ku ewana îlhamdar in, û helbesta wan jî berhema wê îlhamê ye.*

„ Her weha her du helbestvanên firansî Bodlêr û yê îngilîzî Spîndar yê hemdem, xwe dane kêlek Ê.A.Po, û bûne hevalên boçûn û nerînên wî.

Bodlêr weha diçe, ku divê helbestvan destlatdarê helbestê be, rê nede wê ku destlatdarê wî be, da zanîn, hişyarî, aramî û rastiya hunerî di helbesta xwe de bicivîne, û bikaribe li ser wateyan û derbirîna wan destlatdar be.

Her weha Spîndar jî weha diçe, ku cefa di helbestê de her tişt e, belkî ev cefa rojekê, çend heftiyan, an çend mehan bidome, ta ku bête xuyakirin, ku helbest di tevaya vê demê de, jixweberê hatiye nivisîn.

Ji vebriqîna ramana yekemîn bi şûnda çi rola îlhamê namîne. Di dû vebriqîna ramana yekemîn re rola karînen helbestvan dest pê dike, ku bikaribe wan wateyan bi cefa û derbirîna xwe bike helbest⁽⁵⁾.

Bi ser de jî rexnevanê Erebiyê Teysîr Şêx El-Erd weha diçe, ku raman bi awayê tewaw venabirîqe, belê ew beriya, ku bi derkeve meydanê, her tim di hiş de dubare dibe, da ew û xebata helbestvan ya

zimanewanî û kêşesaiyê li hevdu bibanin⁽⁶⁾.

Kiroçê jî para xwe kiriye vê babetê, û îlham şirovekiriye, lê ji çarçewa ewan rexnevanên jor bi dûr de neçûye. Ewî jî rola cefayê helbestvan di dûzankirina berhema îlhamê de zor biha nirxandiye, û weha çûye, ku gelek cefa divê, da helbestvan bikaribe bermaya îlhamê, ku bi xwe nehênî ye, bi derxîne, û bike helbest, pêre jî gîhaye wê baweriyê, ku eger îlham kaniya zîrekiyê ye, zîrekî, di meydana helbestê de, wateya karîna hunerî distîne.

Lê piştî ku zanyarên derûnî tiliya xwe didine ser devera paşhestan (bêageh), nemaze piştî derçûna pirtûka (Cîhana xewnan) ya Sîgmond Firoyd sala 1900î, pirsgirêka îlhamê pirtir ber bi warê zanistî de tê kişandin, ji ber ku pergala û rewsa paşhestan, li nik wan, şûna îlhamê distîne, pêre jî nerînên rexnevanan jî têne guhertin, û giraniyê didine cefa û xebata helbestvanan.

Bi vî awayî, sayî tê xuyakirin, ku ewan rexnevanên, ku di meydana helbestê de, giranî dane îlhamê, dema Eflêtûn de bigir, ta digihînin Kiroçê, nikarîbûn rola cefayê helbestvan di aferîna helbestê de tune bikirana.

Eger em bipirsîn, gelo mebesta wan ji **cefa** çî ye, em bawer dikin, ku mirov dişê, bê dudilî, bêje, ku cefa wateya xebat û karê helbestvan di afrîna helbestê de, nîşan dike; ango me ber bi pelandina durvê (form) wê de; ber bi alavên hunerî, ku helbestvan ji bo avakirina wî durvî dixebitîne de, dikşîne; ev cefa jî ne tenê hîlbijartina kêşê ye, belkî mirov bikaribe bibêje, ku kêş hêsantirîn beşê wî be, ji ber ku kêş, bi xwe, bermayên kesine dine, û ji beriya helbestvan hatine afirandin, dikare bê cefa rahêje wan.

Cefa, wek me berê gotibû wateya kar û xebata helbestvan distîne, awayê ristin û avakirina helbestê distîne; ango hestên ku helbestvan bi wan hestedar e, ji

xwe berê nabine helbest, belê divê ew hestan bi awakî werin wergerandin û organîzekirin; ev awa şêweyê derbirîna helbestî ye, awayê avakirina durvê helbestê ye.

Rexnevanê Ereba Teysîr Şêx El-Erd weha diçe, ku sê stûnên derbirîna hunerî hene, ew jî ev in: Pergala wijdanî ya hunermend, karîna wî ya hunerî, û şêweyê wî yê taybet, ku bi wî dikare li ser xebata xwe ya hunerî destlatdar be, û pêde diçe, û dibêje, karîna hunerî bi xebitandina alavên hunerî û ciwanî tê xuyakirin, ku

hunermend çawan dikare pergala xwe ya wijdanî bi alîkariya wan alavan diyar bike û wê derbas hundirê derbirîna hunerî bike⁽⁷⁾.

Wek çawa koma kevîran ji xwe berê nabine avahiyeke ciwan, belê gelek metiryalên din divên, da avahiya ciwan û tewaw ji wan hemîyan, bi zanîn û xebata avakerê jîrek qulafetê xwe yê dawî bistîne, weha jî koma gotin û peyvên nîkarin ji xwe berê bibîne karekî hunerî ye xweser. Lewre jî rexnevanan her tim alavên derbirîna hunerî pelandine.

Jêder û çavkanî:

* Ev gotar beşek ji pirtûka min (Vedenga hestan) e

(1) Biner: Dr. Mihemed Xuneymî Hilal: Rexneya wêjeyî ye nû. Bi zimanê erebî, Bêrût 1987, rû 345,346.

(2) Jêdera berê, rû 347.

(3) Jêdera berê, rû 348.

(4) Biner: Dr. M. X. Hilal: Romantîk. Bi zimanê erebî. Bêrût 1973, rû 11- 30.

(5) Dr. M. X. Hilal: Rexneya wêjeyî ye nû. Bi zimanê erebî, rû 349.

(6) T. Şêx El-Erd: Pelandina bingeha huneran. Bi zimanê erebî. Weşanên hevgerîna nivîsevanên Ereba, Şam 1991, rû 223.

(7) Jêdera berê, rû 200.

Nişkekuştina Mirovekî Mezin Cîhan Hejand



Memê Alan

Ka em bi hev re nasbikin ev mirovê mezin kî ye?

Nav: Ebdilrehman.

Bav: Mihemed Axa (Bi zanebûn û dewlemediya xwe di civakê de navdayî bû).

Dê: Cole Mebrek (ji Asûriyan bû).

Jidayîkbûn: Ormiya 22 .12, 1930î (sala kuştina Ismaîl Xan Simko).

Xwendin: Hersê astên xwendinê li Ormiyê, Tebrîz û Tehranê qedandin.

Navê tevgerî: Qasimlo bû.

Ji ber dengdayîna bavê Qasimlo, bû yek ji endamên şanda kurdî li Bako berî damezrandina komara Mihabadê ji bo dozkirina maf û azadiya Kurdan. Di sala 1958an de, bi Pêşew Mistefa Barzanî re seredana Bexdadê dike.

Ji ber zanyarî û hişmendiya Mihemed Axa, xwast berê zaroyên xwe bide zanistî û zanîne û li ser şopa axayên Kurd ên wê demê nemeşe. Mihemed Axa gotina xwe ya navdayî ji mal û derdora xwe re dubare dikir. (Bi destên xwe bike û bi diranên xwe bihêre).

Rewşa malbatê hîşt ku Qasimlo ji xortaniyê ve, berê xwe bide xebata niştîmanî û kurdayetiyê. Di dema damezrandina komara Mihabadê de dibe berpirsiyarê komîta rêvebir ya xortan li bajarê Ormiyayê.

Qasimlo yek ji xortên ku, agirê berxwedanê di dilên wan de piştî roxandina komarê gur dibû, û rola wan di vejîna P.D.K.Î de berz bû.

Di navîna salên 1951-1953an de Qasimlo yek ji rêvebiriya P.D.K.Î bû, ku seredanek bi dizî ji Başûr Kurdistanê re çêkirin û roleke gelek berz di yekirina hersê baskên P.D.K.Î de lîstin.

Di jiyana Qasimlo de xebat û xwendinê yekîtiyek çêkirin .

Piştî roxandina K.M, Qasimlo diçe Parisê ji bo xwendinê, û têkliyên xwe bi sosyalîst û komonîstên firensî re berdewam dike .Wê têkliyê hîşt li sala 1949an, riya çûna Çîkoslofakiya (Bajarê Piragê) li ber vebe, û xwendina xwe _beşê aborî li wir bi dawî bike, û bi hevjiyana xwe Hêlîna re (Xwîşka Nîsrin) bizewice. Ew jina dilsoz bi Qsimlo re, ji destpêka 1950î de û ta pakrewaniya wî, hîşt ku bi gelê Kurd û doza wî re jî dilsoz be û di ber de bixebite û ala xebata wî bi rûmet hilde.

Berî sala 1970ê, Qasimlo wek berpirsiyarê yekê ji partiyê re dihate nasîn, ta di sala 1970ê weke sekretêrê giştî hate binavkirin.

Piştî teqlekirina deslata niştimanî û dêmoqrasiyê ya Dr. Mûsedeq ji aliyê Zahîdî ve li Îranê, demekê Qasimlo li wir tevî Hêlîna ma . Li sala 1956an jî, xwîşka Nîsrîn derbasî Silêmaniyê bû, û bi dizî di riya Şamê re çû Çîkoslofakiya û li sala 1957an jî, Qasimlo da dû wê. Bi alîkariya wî gelek hevalên wî mîna Kerîm Hûsamî û Ebdela Îshaq çûn "Biragê" ji bo xwendinê.

Dema şoreşa (14)î Tîrmehê ya sala 1958an li Îraqê dest pê kir bi çend rojan bi Dr. Rida Radminş (sekrêtêrê yekê yê partiya Tode) di Şamê re derbasî Îraqê bû, û ji bo geşkirina berxwedanên Curecur li Îranê bi gelek Çalakiyan rabûn .

Raman û nêrînên Qasimlo yên dûrbîn ji rewşa wê hîngê, çi yên navxweyî û çi yên derve.

1 - Ew baş têdigihîşt yekîti û newekheviya binasazî ya ramana partiya Tode û têkliya di navbera herdu partiyên de çawa divê li ser bingeheke rasteqîn bê avakirin. Yanê hevkarîyek hevbeş bê destêwerdan di hundirê hev de. Lê,wî ji zû de du nêrînên ji her cuda di hundir Tode, di dermafê gelê Kurd de didît. Wê dûrbîna wî di Tode de gelek kelem danîn pêşiya xebata wî.

2 - Ew baş têdigihîşt dirûşma xudmuxtari ji Kurdistanê re di çarçewa têkeliyên xwe û P.D.K.Î bi hemî partiyên Kurdistanê re li ser vê bingehe bike jî .Wêlomê pîştgiriya wî ji bikaranîna demoqrasiyê di hundir P.D.K de, pir tengasî û alozî li pêş wî derxistin, hîşt partî bibe du perçe û ew û

gelek hevalên wî mîna "Kerîm Hûsamî û Hesen Qilcî" ji aliyê destlatên Ebdil Kerîm Qasem ,ji Îraqê jî bêne bidûrxistin . Ne tenê di warê rêzanî de, lê di gelek warên din de jî Qasimlo li Îraqê xwedî çalakî bû.

Nimûne (1): Fêkirina metiriyala dîroka Kurd ji xwendekarên pola yekê re yên kolêja wêjeyê, beşê Kurdî li Bexdadê di bin navê tevgerî "Ebas Enwerî " de.

Nimûne (2) : Belavkirina gelek goterên nirxbuha bi herdu zimanên Kurdî û Erebi li ser komara Mihabadê bi înzeya "ع.أوربا". Piştî vegera wî ya Piragê cara siyem, bi gelek stûbariyan li dirêjahiya (3) salan mijûl bû.

1 - Berdewamiya têkildariyê bi partiya Tode û hevalên ku ala P.D.K hildane ser milên xwe, çî yên li welêt û çî yên li Îraqê re, û xebateke bêhempa ji bo yekbûna partiyê kir.

2 - Li kêlek fêkirina wî di zanîngeha "Karl Markês " de ji beşê aboriyê re. Ew xebitî bo pirojeya Dukturayê û li sala 1962an de, gengeşe kir. Lê, bi ser serkeftina wî di pirojeya xwe de, asta zanistiya wî û xebatên wî yên fêkirinê jî dan ber çavên xwe, rabûn yekser radeya mamostê alîkar pêşkêşî wî kirin, û pirojeya wî ya Dukturayê li ser Kurd û Kurdistanê bi gelek zimanan hate belavkirin.

3 - Kanî demekê pelek ji rojnama yekîtiya nivîskarên Çîkî bidestbixista û baxek ji goterên baş û wergerandî li ser wêjeya kurdî ji welatîyên Çîkî re pêşkêş bikira.

4 - Di piraniya çalakiyên xwendekarên Kurd li Ewropa de alîkar bû. Herwiha ew di nakociyên îdolojîk ên di navêna Çîkoslofakiya û Ewropa de derketine, pişikdar bû.

Dr. Qasimlo dixwast bi hemû hêzên kurdistanî re hevkar be, lê serbixwebûna P.D.K jî parastî be, bi rastî jî ta dawiyê ew ma parastî. Piştî ji nûve P.D.K rêxistina xwe li saz xist , têgeha Demoqrasiyê çiyê xwe di nav rêxwistinê de girt û di navbera salên 1968 - 1974an de Qasimlo wekî sekretêrê giştî ji partiyê re hate hilbijartin.

Li sala 1974an berê xwe dide Ewropa, lê vê carê rêxistinek ji berê bi rêkûpêktir li şûn xwe dihêle û têkiliyên xwe pêre xurt dike. Herweha têkiliya partiyê û gelê xwe bi qada navnetewî û cîhanê re feretir dike. Ji

ber hin nêrînên wî yên taybet ji bo Çîk şopandina wî hate kirin û xebata wî hate astengkirin. wêlomê berê xwe dide Parîsê, lê bi kesayatiyek nûrûniştî. Ji ber wê jî têkliyên xwe bi şêwakî nûtir ava kirin. Yanê mirov dikare di warê raman û îdolojîkî de, Dr. Qasimlo ji zû ve bû yek ji hilgêr û pilansazînerên hin guherînên cîhanê. Eger mirov vegere hin belgeyan wê bibîne, ku Qasimlo di lêkolîneke kurt de li ser sosyalîzmê çêra "Gilasnist Pêristirwîke " bû ye.

Nêrîn û ramanên zanyar, pispor û ramangîrekî Kurd di çarçewa hin bûyerên cîhanê de û paşê jî bi cî hatine ,ji me re serbilindiyeke mezin e.

Dr. Qasimlo di wê demê de jiyana xwe ya zanistî jî, ji bîr nekir. Ji ber wê destê xwe di damezrandina "Peymangeha taybet bi lêkolînên kurdî de li Parîsê hebû, û herweha wekî lêkolînerê di wir de kar kir.

Li sala 1979an, di dema serhildana gelên Îranê de, Qasimlo berî tevan vegeerî Kurdistanê, û roleke berz û bi bandor di pêşengiya partî û gelê xwe de list. Herweha di serhildanê de jî ne bêpar bû, ta Rijîma Şah hate roxandin.

Piştî roxandina rijîma Şah "Rida Behlewî" û şûnegirtina rijîma Xumeynî jê re, Qasimlo ji bo çarenûsa pirsê gelê Kurd li Îranê dest bi guftûgoyan kir . Lê ne baweriya bi rijîma nû û ne jî nêrînên lezok ji bo roxandina wan gotûbêjan û hewildanên rakirina çekan. Qasimlo ji dûzan nedixist, lê, dema ew baş têgihîşt ku rêbaza şofnîzmê li ba oldaran û nepejrandina wan ji mafên Kurdan re hate diyarkirin: P.D.K.Î bi mêrxasî xebata çekdarî kir û Qasimlo yek ji wan lehengên Kurd bû.

Dr. Qasimlo, ne di serkeftinan de pozbilindiyê pê digirt, û ne jî di şikestinan de dilsar û xemsar dibû, herweha hertim dijberiya terora hundirî û navnetewî jî dikir.

Berxwedana Qasimlo di hemî waran de çi rêxistinî, guftûgo, çekdarî ,nakokiyên hundir partiyê, baweriya wî bi çareseriya kurdî bi şêwakî aştiyane û gelek tiştên din çi li hundir û çi li derve, hîşt ku Qasimlo bi daxwaza rijîma Îranê ya kevnepereşt bo çareseriya pirsê kurdî re, di riya gengeşan re nebêje na. Lê daxwaza rijîma xwînvexwar ne çareseriya pirsê kurdî bû, mixabîna armanca wê serê pêşeweyê Kurd Qasimlo bû. Vêca li

sala 1989an, dema ku bi hin kujerên rijîmê re rûnişt, bi destê wan kujeran di gel hin hevalan Ebdela Qadirî, Dr. Fadêl Mile Mehmûd û Mile Resûl ve hate kuştin. Mirinek dunya hejand. Qasimlo di jiyana û mirina xwe de mirovekî gewre bû.

Hevalê berxwedana wî ya salane, nivîskarê navdayî "Ebdela Hesen Zade" di dermafê wî de, di goristana "Piyêr Laşê" ya pîroz a pakrewanên komona ... Parîsê de weha salix da:

"Dr.Qasimlo, Şehîdê riya rizgariya Kurdistan....û Îranê bi gîştî ye, pêşengekî zîrek û xebatkarekî xemsarî û dudilî nizanî, û dîroka tevgera rizgariya gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn ên wekî wî nedîtine. Qasimlo siyasetvanekî xwedî ramanekî dîrbîn û berxwedanêrekî xurt, kesyatîyek zanistî mezin û şoreşgerekî jêhatî bû .Qasimlo li ser riya bidestxistina azadî û dadmendîya civakî dixebitî û ji bo hilanîna bînpêkirina mirov ji mirov re û çarenûsa gelan bi dest xwediyên wan ên rastqîn de kar dikir. Baweriya wî bi demokrasîyê kûr bû. Wî bi her hêza xwe bo pêkanîna demokrasîyê di hundir P.D.K û civakê de dixebitî. Belkîm ziyana gihîştî partiyê jî bi encama ferehiya demokrasîyê bû. Wî tim digot :Yê bixwaze demokras be, divê qelengê wê jî bide.

Dr. Qasimlo Welatperwerekî Kurd bû, bi çarenûsa hevbeş a gelê Kurd ayîndar bû û didît ku serkeftin an roxandina peçeyekî Kurdistanê serkeftin û roxandina percên dine jî. Wêlomê didît ku nexeme fedekariyê bi qezencên demkî yên partiyê ji bo armancên îstiratîjîk ên gelê Kurd were kirin. Herweha di dema ku, daxwaza mafên netewî yên gelê Kurd bi gunehkariyek mezin û cudewazebûnê dihate salixdan;


Qasimlo di pirtûka xwe ya navdar " Kurdistan û Kurd " de bang dikir û digot: Gelê Kurd ji gelên din cuda ye,wêlomê bidestxistina wî ji çarenûsa xwe re di welatekî de, nîşana yekîtiya wir e û ne cudewaz bûne. Erê; Dr. Qasimlo Xebatkarekî rasteqîn, zanyar û pendeyar bû. Wî bi deh zimanên rojhilatî û cîhanî zanî, zarava malê kurmancî bû, lê wî wek nivîskarên Mukiryane û Silêmaniyê dinivîsî. Ewî weke evîndarekî rasteqîn ji helbest û mûzîkê re nav da, û gelek helbestên "Baba Tahir û Ehmedê Xanî " jî li ezber kiribûn. Dema ku kî an parçak mûzîk dibihîst, di cî de digot: Ev perçemûzîk a "Bêthovin, Mozart, Bax, Şostakovîç, Fikret Emîrof " an jî

ya " Xeca Doryan " e. Lê çiqas wî li mûzîkên biyanî guhdar bikira, weke ku li mûzîka kurdî guhdar bike dihate xûyan.

Ew di neqşeyên cîhanî, gul û daran de jî pispor bû, herweha zanyarekî mezin di aboriya welatên li pêş û şûn de bû. Ew bi cotariyên Kurd re, li ser gênim, cihê, bêder, hevcar, amûr û alavên çandinê, wek lawekî cotariyan, ne lawekî derbegan daxivî. Ew kurê bajêr, gund û çiyê bû. Ew lawê Kurd, lawê rojhilat û wî bi rabûn û rûniştin û gendîşe û toreya Ewropa jî zanî. Yanê mirov kane wî bi kur û lawê cîhanê bide navdan. Herweha didomîne û dibêje: Her ku, ez dostaniya 35 salan bi wî lehengî re bibîr tînim, ez ji xwe dipirsim: Çawa mejiyekî weha rawestî û pêlana keveperestên Îran û cîhanê di ser re derbas bû. Lê ez bi xwe jî bersivê didim xwe û dibêjim: Erê pêlaneke mezin di dermafê mirovekî weha mezin de hate ristîn.

Jêder:

- Komara Mihabadê.
- Çil Sal ji berxwedanê ya Dr. Ezedîn Mustefa Resûl.



Navdêr

Her tiştekek bi **navekî** tê nasîn. Di warê rêzmanî de, ji navên tişt, mirov, lawir û ramanan re **navdêr** tê gotin.

Di Kurdî de ji aliyê wateyê ve, du cureyên navdêran hene.

1 - **Navdêrên bernas** (*serenav*).

Nimûne: (Alan, Dilyar, Kendal, Kanîzar, Rewşen, ...).

2 - **Navdêrên celeban**(*hevenav*): Ew jî du cure ne:

a - Navdêrên şênber: Ev navdêr her tiştekekî ku mirov bi wî hestiyar dibe nîşan dike. Nimûne : (Çem, kevir, dar, kulîk, gulistan).

b - Navdêrên razber : Her tiştekekî ku mirov pê hestiyar nabe, navdêrên razber in. Nimûne: (Azadî, can, raman, nîgaş ...).

Zayenda Navdêran

Bi tevahî, di Kurmancî de du zayendên navdêran hene, **Mê** û **Nêr**.

- Di Kurdî de zayendên hin navdêran bi peyva nêr, û mê têne naskirin.

Nimûne: Berxê nêr. Berxa mê. Kera mê. Kerê nêr.

- Zayenda hin navdêran bi pêşkîtan têne naskirin, hin ji wan pêşkîtan: Dêl, mê , dot, pis, man.

Nimûne: Mê + kew = mêkew.

Dot + mam = dotmam.

Pis + mam = pismam.

Dêl + gur = dêlgur.

Di Kurdî de hin paşkît hene navên cihan pêk tînin wek (xane, geh, istan).

Nimûne: Pirtûk + xane = pirtûxane.

Zanîn + geh = zanîngeh.

Dar + istan = daristan. .

Li ba Kurmancan, bi tevahî zayendên heyînan wiha hatine nasîn, lê awarte jî hene:

Navdêrên mê wek:

- Giyanewerên mê: Jin, marî..

- Tiştên kolandî, qul û dûz: Şikeft, deşt..

- Bêjeyên raderî: Anîn, serkeftin ,xwendin..

- Rêxistin û sazî: Komele, partî ,sazî ..
- Alavên navgîniyê: Makîne, telefûn..
- Serenavên xaknîgarî: Afrîkqa, Rojava..
- Tiştên ku li ezmên in, yan tiştên ku ji ezmên tên: Stêrk, ronak..
- Yên navên çaxê dinimûnin: Kat, werdek, meh..
- Nexweşî û birîn: Wêran, pençeşêr..
- Şîv, xwerinên kelndî, û navên alavên xwerin...
- Bêjeyên razber yên pêkhatî: Jêhatî, hişmendî..
- Alavên mûzîkê û tiştên nivîsandinê wek: Tembûr, pênuş....


Navdêrên nêr wek:

- Giyanewerên nêr: Mêr, kewnêr..
- Endamên laşê giyaneweran ên derve: Dest, zik.. beloq û bilind: Çiya, kevir..
- Berhemên lawiran: Şîr, goşt, mast,penêr...
- Ezman û ba.
- Navên hesinan û rengan: Zer, baqir..
- Çekên lixwekirinê:Kurk, şelwer..
- Darên hişk û birî: Text, çov..

Ferhengoka Erebî - Kurdî

Dibistana seretayî: المدرسة الابتدائية	Kolêca bazirganî: كلية التجارة
Dibistana amadeyî: المدرسة الاعدادية	Kolêca yasayî: كلية القانون
Dibistana navendî: المدرسة الثانوية	Kolêca jîngehê: كلية البيئة
Amojgeh: معهد	Kolêca dermansaziyê: كلية الصيدلة
Amojgeha hunerî: المعهد الفني	Kolêca bijîjkî: كلية الطب
Amojgeha tenduristî: المعهد الطبي	
Amojgeha sazkarî: المعهد الصناعي	
Amojgeha çandinî: المعهد الزراعي	
Amojgeha werzişî: المعهد الرياضي	

Ji pirt[ka (Zimanê Kurdê Fêr Dibin
- Asta dudiyê) ya S.F.P.Z.K.



Werger û amadekirin.
Tengezarê Marîni



Oh, xwedê em, li te geriyan, li nav hemî xirbeyan, li nav cokên bombeyan, her şev, me bangê te kir. Xwedê! Me kire ewt-ewt li dûv te, girîn, derbeder bûn! Tu li kû bû xwedayê dilovan? W.Borchert.

Di 20.Gulanê sala 1921an de, li Hamburg ji dayîk bûye, ji dê û bavekî rewşenbîr, temenê wî 15 sal bû dema dest bi nivîsîna helbestê kir.

Di sala 1939an de, dest bi xwendina dersên bazirganiya pirtûkê kir, lê piştî salekê xwendina xwe birî û dest bi vekirina kursên ekteriyê(lîstika şanoyê) kir û di wê salê de, cara pêşîn helbesteke wî di belavoka „Hamburger Anzeiger“ hate weşandin.

Ji ber hezkirina **Wolfgang Borchert** ji şanoyê re, bo ekterekî zîrek û di sala 1941ê de, li Hannover-rojhilat, li ser textê şanoyê lîst, pişt re şanoya gerok avakir û li Lüneburg kar bo xwe dît. Ev dema kurt, ya herî xweş di jiyana wî de bû, wek wî nivîsîbû, lê mixabin di wê salê de meha Cehzerê (hezêranê) de, çû xizmeta leskeriyê.

Di sala 1942an de, di şer de birîndar bû û bi êşa Defteriya ket.

Borchert bi xwe li dijî wê cenga ko Hitler li dijî welatên din vekiribû bi nivîsên xwe, li dijî derdiket û ev jî bo wî cihê metirsiyê bû. Ev derketina wî û nivîsên wî bûn sedema zindanîkirina wî û li Novemberê avêtin eniya rojhilatê, lê ji ber nexweşiya wî û gumana nexweşiya Hepatites ê û daku li nav leşkerên hevalên wî berbelav

nebe, ew ji leşkeriyê sala 1943an azad kirin. **Borchert**, di sala 1943an, dubare hate zindanîkirinê. Sedema girtina wî jî, ji ber wek lîstikvanekî kabaretîst lîst û yariyên xwe bi **Joseph Goebbels**, ko wezîrê ragehandinê di demê Hitler de bû kir.

Di sala **1944**an de, **9** mehan li **Berlînê** kete zindanê û hukum wek dijminekî pêhat. **Borchert**, li Ferensa hatibû dîlkirin. Di sala **1945**an de reviya, pir nexweş bû, lê dîsan li Hamburg mîna Regîassistantekî li Hamburger Schauspielhaus karkir.

Yekemîn berhem ya **Borchert** yê helbestî, di sala 1946an, bi navê "**Çira Şev û stêran**", helbestên wî yê di navbera **1940 -1945** hatibû weşand.

Bochert ne tenê helbest nivîsîne û ekter lîstiyê, belê kurte-çîrok û çîrok nivîsîne, ji wan, çîroka wî ya bi nav „Gula kûçik“. Babeta vê çîrokê, çarenûsa mirovan di şer û piştî şer de diyar dike.

Di çirya paşî sala 1947an de, di gel ko **Borchert** bi nexweşiyê giran bû û zanîbû jê rizgar nabe, di hundurê heftiyekê de, drama xwe ya expressiyonistî ya bi navê „Li derve, li ber dergeh“ nivîsî, ko bêhtir jiyana wî ya leşkerî bû. Piştî şer vedigere welatê xwe, lê di şerpezetî, tenêti û belengaziyê de, temenê xwe dibhurîne.

Berhema wî ya dawî di jiyana wî de ko hatibû weşandin bi navê „Di rojêke Sêşembê de (1947)

Wolfgang Borchert di 20. November 1947, li Basel wexer kir û piştî mirina wî bi rojekê Drama wî li **Hamburger Kammerspiel** lîst. Berhema wî ya nehatî çapkirin, ko bi navê „**Tolgînên xemgîn**“ di dûv mirina wî re, di sala 1962n de, hate weşandin.

Ramîsan

Baran dibare - erê ew hest nake,
Ji ber dilê wê ji xweşbextiyê dilerize:

ramîsan cîhanê di xewnê de dixendiqîne.
Kirasê wê şil û qermiçi ye
Wisa bê agahdarî bi jor ve hilkişiya,
mîna paqên wê bo her mirovekî li wir be.
Pizrûkê baranê, yên ne ji bo tiştêkî firfirîn
tiştê kesekî nedîtibe, dîtibû,
Wisa giran hîn agah lê nebû -
giyanekî bêwate pêdivîye lawir weha bin!
Pirça wê mîna kaxezek pîroz berba bûye -
çira tevna xwe tê de dihûnin..

Strana evînê

Ji ber niha dê şev bê,
ez ê li nik te bimînîm.
Ez dikaribim bo te çend bim,
dê bidime te!
Qet pirsê ji min neke:
Ji kû û bi kû ve -
evîn dê min bibe,
min bi tevayî bibe wir!
Bibe, şeveke dirêj bo min
nazdar bo min.
ji ber tenê şevekê
dê li nik te bimînîm.

Xatirxwestin

Maçek bû liperavê –
derbas bû.
Xurrîna sûlavê û derya berbi te ve
tajo.
Û roniyêke sor û yek kesk
xwe dûr dikin...

Bizavê bike

Xwe têxe nîva baranê,
behweriyê bi pizrûkên lêbuhurînê
bike,
tevna xwe di xirûcirê de bihûne
pêkolê bike baş bî!
Xwe têxe nîvê bayê,
pêbehwer be û zarok be -
rê ji bagerê re veke bo derbasî te bibe
pêkolê bike tu baş bî!
Xwe têxe nîva êgir -
hez ji felaketê bike
di dilê meya sor de
pêkolê bike baş bî!

Baran

Mîna pîrejinekê diçe
Bi xemgîniyeke bêdeng di welat re.
Pirça wê şil e, matoyê wê gewir,
carnan destê xwe hildide
Bi dilsarî li cama pencerê dixê,
cihê ku perde bi dizî pist-pistê dikin.
pêdiviye keçik li mal bimîne
belê îro weha jiyaxweş e!
Ba pîrejîne ji porê zeft dîke,
û rondikên wê dibin lekeke kovî ye .
Verwegen läßt sie ihre Röcke fahren
û semayê dîke cinîtî mîna pîra sheherdarê!

Helbest

Gul bi narînê weha sor geş dibe,
Gul bi comerdiyeke mezin di ber de şîn dibe.
Gul bi narînê jîyan e,
gul bi comerdiyeke mezin mirin e.
şêrîn û miz e jîyan,
miz kêf e û şêrîn tengasî.
gula jîndar weha sor geş dibe
gula mirî şîn di ber de geş dibe.



Van Çavan Çi Nedîtin...!

Merwan Berekat



Van çavan çî nedîtin..!

Mirovên ku bere mirina xwe dibezîn, ên ku kevirên sînoran hildikirin, ên ku çen di zikê xwe de daçikandibûn û berxwedêrên ku tovên jiyanê diçandin jî dîtîn.

Van çavan çî nedîtin...!

Dayîkên ku di nav hilweşandinê de li şîrmêjên xwe digerin, zarokên ku ji qurequra zikê xwe vediciniqîn, meqesokên ku nalîna şaxan dinikilandin û bajarên ku ji lêmiştên xwînê hawar dikirin jî dîtîn.

Van çavan çî nedîtin...!

Rengên ku ji dîmenan direviyan, hestiyên ku gora xwe diguhartin, balindeyên ku riya hêlûnên xwe şaş kiribûn û kalemêrên ku ji nû ve porê wan reş bûbû û li eniyên berxwedanê tiving dilîskandin jî dîtîn.

Van çavan çî nedîtin...!

Bîranînên ku di gewriya kolanan de raketibûn, riyên ku ji gavên penaberan diqîriyan, termên ku bi êgir nedişewitîn, tirsonekên ku ji hemêza dilovan bazdidan û çavreşên ku tirs dixistin dilê zirtoneyên tundrew jî dîtîn.

Van çavan çî nedîtin...!

Govdeyên bê serî û xaçkirî, kursiyên ku ji perasuyên perîşanan çêkirî, pizdonekên ku bi windabûna xwe şadibûn û bejnên ku li qadên dîrokê bilind dibûn jî dîtîn.

Van çavan çî nedîtin...!

Devên ku ji bo pariyek nan ji bergeran xar bibûn, serberjêrên ku diziya rûmeta xwe dikirin, kabşikestiyên ku ji siha xwe ditirsîn û bejnên ku ji ronahiyê şewq didan jî dîtîn.

Van çavan çi nedîtin...!

Lîstokên ku li gixikan digerîn, bermayên havîneke pîr, kesên ku qirêja bajarên kedîkirî ji rojên xwe dadiweşandin û yên ku dem ji porê rojê dihûnandin jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Jinên ku di hîrehîra birûsk û bêzariyê de noq bûbûn, ên ku di nav mijangên xwe de ahengên girî li dar dixistin û yên ku roj û şev dikirin serpêhatiyên şanaziyê jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Payîzên ku ji keskahiya merxan re çogvedan dikirin, êvarên bi bêdengiyêke şewitî pêçayî, pencereyên ji fîrefîra bê avis û kulîkên ku giriyê baranê dikenandin jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin..!

Dilên ku keziyên sêwîtiyê dihûnandin, keçên ku êşên gustîlkan dijmartin, xortên ku di dêmên wan de axê reng vedabû û mirovên ku dem bi gavan dax dikirin jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Dîlberên ku bîranînên wan ji xoya erdê bûn, miltanên ku bişkovkên wan hawara rizgarkirinê dikirin, mirina striyan li bin baranê û pênuşên ku wate vedijandin jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Ewrên ku ji demên tî koç dibûn, tîrêjên ku di nav lêvên bajaran de lukumî mabûn, zinarên ku pišta lehengan diparastin û nêçîrvanên kewan jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Tiliyên ku nexşeya welatekî jibîrkiri nîgar dikirin, herifandina salên bê buhar, xanimên ku rengê gênim ji çavên wan dadirivî û refên kevokan ên ku bere rojê difirîn jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Êvarên ji xwînê vexistî, salên ku li ser balgiyê loman raketibûn, derdvêketiyên ku di nav şeqên rojan de dilolijîn û sozdarên ku çerx û felek diseridandin jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Meynoşên ku kêliyên kovanan vedikirin, destbiheneyên ku li hawîrdora hila daniyan lîlî azad dikirin û zendên ku bazin ji xwe dişiqitandin jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Serserî û nokerên ku di devê diya xwe de tif ziwakiribûn, ramûsanên ku di argûnkan de dişewitîn, lêvên bîran ên ku ji mêj ve negrîbûn û mêrxwezên ku şahî diyarî pêsîran dikirin jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Mirovên ku bi paşde de dizêvirîn û dem zext dikirin, semaya hingan li hawîrdora kulîkên bê xunav, pinpinîkên baskor ên ku di şewtandina xwe de hildiperikîn û civakeke ku li vedengeke dûûûr guhdar dikir jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Dostên ku di nav perasiyên hev de ronahî berhef dikirin, ên ku ji neçarî piyala biyaniyê bi ser xwe ve dikirin, ên ku gurûziyan çavên wan ditemirandin û yên ku bi xwe re dipeyvîn û riya mal şaş dirin jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Gundiyên ku her yekî ji wan deh şoreş di sêrê de bûn, ên ku bîneke kevnar ji xwîna wan dihat û yên mîna pexşana hêviyan bere bîreya sibehan rêketibûn jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Memikên ku hemû veşarteyên siberoja welêt di xwe de hilgirtibûn, pîrikên ku navika torînên xwe dibirîn û li bin dara guvîjê binax dikirin, aşên ku li ber bê digeriyan û nexşeyên ku li ber lingên mêriyan tol dibûn jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Çekdarên ku digotin: Bîrîna me bajarekî xweşik e, yên ku di nav şaxên dara zêtûnê de li navê hevalên xwe digeriyan û yên ku rê li pey wan dibeziyen jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Gorên bê nimre û bê term, pênûsên qurşînî yên nîvşewitî, seriyên nezanîne yên ku hinan ew kiribûn kargêrên saziyan û malên ku bîna şewitandina wan bêfilên bajaran xetimandibûn jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Jinebiyên ku ax di dawa xwe de dibirin li pêş deriyên gulistanan rêdixistin, ji bo ku êşên xwe têde biçînin jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Kesên ku ji dîwaran nizimtir û zengilê dibistanan didizîn û hewil didan ku nêçîra baran û mêjê bikin jî dîtin.

Van çavan...

Perwerên ku rengê daniştekan û vedenga tîpan di giyan û xeyala xwe de mezin dikirin jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Ciwanên ku ji awirên keçan gêj radiketin, ên ku evîndarî li ser lêvên wan dinalî, keçên ku bi bedewiya xwe ronahî dişuştin û yên ku destên xwe yê çepê li pişt destgitiyên xwe dixistin û digotin: Çima tu li vir mayî? Jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Zavayên ku lênûsa bîranînên ciwaniya xwe bi agirê cîgarê dişewitandin, mirovên ku berîkên xwe ji derewan dadiweşandin û bûkên ku kûpê rojan ji fêrmiskan tijî dikirin jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Pel û şaxên ku ji ezmûna bê û daran têr nedibûn, fîstanên ku lêvên bê ji ramûsanên şermok sermest dikirin û çenteyên zamdariya derfetên beravêtî jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Yên ku destên xwe di berîka axê de ji bîr kiribûn, ên ku giriyê kaniyan birîn dikirin, ên ku ji hestên rêdûr re gore didrûtin û yên ku govdeyê xwe bi toza riya karwanên pakrewanan pîroz dikirin jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Welatperwerên ku di navbera mirin û tabûta evîndara xwe de qurnefîlek diçandin, ên ku daxwez û hêviyên xwe di çemên tengijî de berdidan û yên ku tarî di gewiriya bagerên nevegerê de dişimitandin û dihîştin ku zinarên welêt jî bipeyivin... jî dîtin.

Van çavan çi nedîtin...!

Pêxemberên rengê spî ku bi tiliya nîşanê tola ferîşteyên Helebçe hiltanîn, û tovên jîne li dêrîniya welêt diçandin jî dîtin.

Van çavan çî nedîtin...!

Romanên zamdar û yên jiyanzê... Çîrokên xemgîniyê û yên nemiriyê...

Sirûdên perspankirî û yên hebûneke vebrûsandî... Newayên bêzariyê û yên azadiyê.... Şevên pîrkabûskî û yên miştevîn... Riyên kelemkirî û yên ji kesk rêxistî... Ahengên girî û yên şanaziyê... Rojên xeftanxalîkî û yên keskesorî... Rêweresmên bêdeng û yên bi stran û helbest.... Bilûrên nalînrej û yên şahîvejîn.... Devên konikgirtî û yên bangrût.... Jî dîtin.

Efrîn

26. 10. 2014

.

MIN BÎRIYA XWE KIRIYE

Çûk û çivîkên welatê min bîriya hêlînên xwe yên germik û nerm kirine, bîriya ezmanê xwe yê bêdeng û sayî kirine. Gul û kulîkên welatê min bîriya bihnên xwe yên xweş kirine, bîriya rengên xwe yên geş kirine. Evîndarên welatê min bîriya dengên dilên xwe kirine, bîriya dengvedanên hestên xwe yên xurt kirine. Zimanê welatê min bîriya peyvên xwe yên şêrîn û zelal kiriye. Şoreşa welatê min bîriya al û sirûdên xwe kiriye, bîriya cejn û Newrozên xwe kiriye, bîriya hêviyên xwe yên ron û dewlemend kiriye. Min pir û pir bîriya xwe kiriye, ji ber ku ez... ew tev im.

Rûxweşê Zîvar

Sînorê Bê Nasname



Ronî Elî

Li ser sînor
Berî ku kevçiyek av
Di zenguloka demê de berdim
Min xewnên xwe
Bi rondikên pîrejinekê re
 Vedixwarin
Hew bi tenê
Toza zeviyekî nêr
Çavên min
Ji wêneyên bajar û bajarokan
Tijî dikir in
Û tu ..
Yara kuştîyê xewnan
Li ser pišta mihîneke tîmarnekirî
Li bîra min dihat
Wê gavê
Min û dîwarekî piştixûz
 Xwe di hev werdida
Li ser sînor
Nasnameyên mirovahiyê
Bê welat diman

Dibûne xaçika geşbîniyê
Û termê giyanê min
Ew dişopand
Lê .. min nizanî
Ku wê çavên te
Ji hevokên sozdariyê re
Weke goristanên welêt
 Tîşka stêran daqurtînin
Li ser sînor
Kelekela şewata zivistanê
Bi gupikên Baranê re
Dilê min
Bi helbesta .. Yarê .. Dax dikir
Mirîbûn li wir zindiyên me
Zindîbûn di hinavên mirî de
Girnejîngên lêvên te
Û karwanê xeman
Di devê newalan de
Gewriya jînê diguvaştin ..
 Dirûçikandin
Min jî ...
Di hembêza te de
Ji çivîkên nifirlêketî re
Hêlûna welatekî serast dikir
Berî ku tûrikê pišta min
Ji pençeyên te re bibe talan

Dergûşên şîrvekirî
Li hambêzekê digeriyan
Kenê min
Li pişt kilaşînkofekê
Sêwî dima û xwe vedişart
Tenê mijgulên te
Di goristana reşbîniyê de
Li ser sînor
Çêrokên jinebiyan
Di landika sêwiyan de
Bê dawî diman
Tovên geşbûna siberojê
Di mistên mendalan de
Zer dibûn ... Genî dibûn
Hevîrê nanpêjan
Mîna gêrêka malbatan
Kurim lédiket
Pêlavên xaniman
Di devê rêçikan de
Dilerizîn .. Mest diketin
Nameyên ku ji dil re arvan bûn
Li ber destên te .. Kedî dibûn
Ji ber ...
Kîna sîngê te
Ew di çateriya mirinê de berdidan

ÇÎROK IM

Ronahiya dilên xemgîn
Qêrîna jiyane
Hêza niştimaniyê
Nîşana qehremaniyê
Dilovaniya jina Kurd im
Ez çîrok im
Ala azadiyê
Rondika diyên pakrewanan
Pêdariya berxwedêran
Kulîka li sirtên tî
Kila çavên dîrokê me
Ez çîrok im
Giyane keçên leheng
Jiyana pîrejineke Kurmanc
Rûmeta şoreşeke bê xwîn
Kaniya hezkirinê
Kenê bajarên hêvîkesk im
Ez çîrok im

Mîdiya Berekat

Xewna Kardox

Osman Îso

Hevpeyvînek ji buhuştê Kardox hilma darên Zêtûnê û gunehên kuştina kurmê dêr û serjêkirina pîçikan li piştta xwe dike û vedigere mal. Berêvarê di berîka Kardox de çavxulmaş dibe, stiwê wî li yan dikeve û di hembêza mûjên ku şîrava axa pîroz ji wan diherike serê xwe bi dilşadî datîne û radikeve.

Bayê li danê şîva xuha Kardox radimûse û li peleke zêtûn ya ku xwe di nav porê Kardox de veşartibû, dibe rik dixwaze dûr bavêje û bi tenê seyvana xwe di nav por de bike, lê pelê zêtûnê jî bi riktir mîna sewdaliyan porê Kardox bihn dike û wî hembêz dike. Çend teneyên axê û çend jî yên zêtûnê di berîka Kardox de dîlanekê li dar dixin.

Şîva dayîka dilovan (hevîrekî sar û dewekî hênik bû) wê giyanê Kardox geş dikir, lê westandin û xewê li ser laşê Kardox şer dikin. Xew mîna pisîkan dûvê xwe di çavên Kardox re duxuşîne, û di zemînê hestiyên wî de westandin bi gayê êşan cot dike û xeyalên Kardox bi dezîyê hişyariyê û xewê têne dirûtin. Kardox xwe di gulîstaneke miştbihin de dibîne. Di ber awaza rûbarên noranî re bilbil bi serxoşî stranên xwe dirêsin, lê tiştê herî balkêş ew bû, gava ku Kardox mirovin li derdora maseke xemlandî bi peyalên meya Xwedê dibîne, bi kûranî li wan mêze dike û wêneyên wan tîne bîra xwe. Şadî di dilê wî de bi lez dibeze û peyv li ser zimanê wî li orta hev dikevin û dibêje: Ev win in?

Ew mirovan dibêjin: Belê em in. Keremke were, tu jî li ba me rûne. Kardox bi dilgermî dere dest û riwên wan û hema hema dilê wî ji eşqa re bifire. Kalemêrekî ku ronahî ji rûyê wî dibarî ji Kardox re got: Kurê min, te em nas kirin? Kardox: Belê apo.

Apê Osman: Kurê min, ma hîn berpirsiyar li kursî û peran digerin?! Ma hîn dibêjin (Kî berx e, û kî beran e?!

Cîgrxwîn: Kurê min, Ma Kurdan yekîtiya xwe ava kirine, yan na?! Wan dev ji durûtî berdane, yan na?! Ma hîn ew benîştê partîtiyê dicûn?! Lê hîn mîna refê tîtiyan mane?

Ehmedê Xanî: Kurê min rastiyê bêje û bila dilê min ji kerb û şewatê ducarkî nemre, dil vejîne û mûma hêviyan vêxîne û bêje: Aso bi ala tifaqê hatiye xemlandin û bilbil serxoş in. Bêje kurê min. dil nerewsîne ji şewatê û avde vê meraqê.

Şêx Se,îd wiha got: Me ji bo Kurdistanê canê xwe kire gorî. Me nedigot: Kurmanc, Soran yan jî Lorî û temenê lehengan bi mêrxazî borî. Bi ser me de hate ewrekî tarî û jehir bi lêmiştan di ser me de barî. Şoreş bi pêlanan dorpêç kirin, ji çaralî ve hêviyên me çelmisandin û kirm parîparî. Kurê min bêje: Ma Îngilîz û Rûs hîn we dixapînin?! Hîn sozên hunguvîn şax didin? Ji devê rovî Kurd parve dibin? Bi destên hovî, Sultanî yan Sefewî ne, yan jî Musلمان yan Êzîdî ne? Kurê min şîreta min li we be bêjin: Em kurdperwer û kurdistanî ne. Di bazarên cîhanê de, em ne xwefroş in.

Kardox got: Em hişiyar û tev berpirsiyar in, ji kurmê yekalî rizgar in û li hespê azadiyê sîwar in. Me ezezî şewitanid, dilopên kurdayetiyê bûne baran û bi ser dilê me de dibarin. Em hişiyar in. Diya Kardox wî dihejîne û dibêje: Kardoxê min, hêşiyar be şagirtên dibistanê li benda te ne.



Gulistan Awaz

MEYRO Pîrekjineke Kurd e. Pîrejineke bejinzirav û lihevhatî ye, dêmliken û rûgeş e hema hema mîna ferîşteyan e. Xwed têra xwe şêrînî, xweşikî û bedew di rûyê wê de herikandiye.

Baweriya Meyro pir bi Xwedê heye, bi ser zarokan de banok e û dikare hemû zarokên cîhanê di bin konê dilovaniya xwe de bicivîne.

Cîranên Meyro pir bextewar in, ku ew cîrana wan e. Ji ber ku Meyro şahî û şînê bi wan re parve dike, û rêzdariya biçûk û mezinan digre. Pîrejineke aşîxwez e, ne devsist e, hevaldost e û eger yek ji cîranên wê bixweze tevleheviyekê di nav cîranan de çêke, ew wî/wê paş de vedigerîne û ya rast li pêşiyê serast dike.

Bêguman pîrejinên mîna Meyro di civaka me ya Kurdî de pir in, lê Xwedê wan pirtir bike.

MEYRO pîrejineke Kurd e. Rûyê wê her ziwa ye, yanê belkî min nanek û wê jî nîvnan xweriye. Du ciwanên wê hene, eger mîvanekî wan tê, ji pitepitên Meyro nikarin çend gotinan bi hev re baxivin. Ji bilî wê, Meyro pîrejineke devsist, durûtî û xwedîya tevleheviyê di nav cîranan de ye. Di nav cîranan de dostên Meyro nînin, pir dibêje lê hemû gotinên wê wek ziwabûna rûyê wê ne û tucarî ken di dêmên wê de neherikiye.

Bêguman pîrejinên wek Meyro di civaka me de hene, Xwedê wan wan vegeerîne ser riya rastiyê, û civaka me ji Meyroyên rûziwa biparêze.

Pend û Şîret

- Zik ne têr e, dibêje kumê min ji zêr e.
- Eger Ferat bi şîr be, bişkul bi hejîr be, kêse bi mîr be, hîngê kuxpîn wê bi eşîr be.
- Sîr xwariye, dibêje bihna pîvazê ji devê te tê.
- Direve û dibêje metirsin, ji hespê ketiye û dibêje ez sîwar im.
- Perehez nabin mirovhez.
- Nav Mam e û îmam e, lê avdasê nizane, min ci ji nimêjê ye.
- Jin heye jiyane, jin jî heye derd û jana.
- Eger tê mal, dibe kal û dike nalenal.
- Ji xwe xweş e, lê bextreş e.
- Bi mor e, lê kor e.

Pêkenok

Sê dîn hebûn.. navên wan ev bûn: Şaşo, Taşo û Reşo.

Ewan di holkekê de rûniştibûn, Şaşo û Reşo gotin: Em tî bûn.

Taşo got: Ezê herim ji ew re avê wînim. Ew rabû sê caran li hawîrdora holkê zêvirî û kete hundirê holkê, ji Şaşo û Reşo pirs kir: Av li cem we heye ? Şaşo û Reşo gotin: Fermo rûne, me hevaleyê xwe şandiye avê, eger wî anî emê tev vexwin!!

Fûrto ji Xewo re got: Eger tu zanibî çend mirîşkên min hene, ezê her çar mirîşkên xwe diyarî te bikim.

Xewo got: Şeş in !!